# Bultena heftane

# 16/3/2024

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

## [‘Dadgeh bi bernedana Sara Kaya hewl dide tolê bigre’]

Hevşaredara berê ya Nisêbînê Sara Kaya ku qeyûm tayînî şûna wê hat kirin û ji sala 2017'an ve girtî ye, tevî cezayê wê qediyaye jî nayê berdan. Wekîlê Partiya DEM'ê parêzer Kamûran Tanhan got: "Dadgeh bi hesta tolhildanê tevdigere.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dadgeh-bi-bernedana-sara-kaya-hewl-dide-tole-bigre-44303

Çavkanî:JINHA



## Nesrîn Cafer: Sê zarokên min di hembêza min de bi gaza xerdelê mirin!

Di ser komkujiya Helebceyê de 36 sal derbas bûn. Nesrîn Cafer yek ji mexdûrên kîmyabaranê ye û sê zarokên wê di hembêza wê de bi gaza xerdelê jiyana xwe ji dest dane, diyar kir ku tu carî wê rojê ji bîr nake.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/nesrin-cafer-se-zaroken-min-di-hembeza-min-de-bi-gaza-xerdele-mirin-44305

Çavkanî:JINHA



## Jinên Misrê ji bo parastina destkeftiyên xwe têdikoşin

Jinên Misirê yên ku di çarçoveya 16'ê Adarê Roja Jinan a Misrê de nirxandinan kirin, dan zanîn ku tevî destkeftiyên xwe jî ji ber pergala mêr-dewletê hewl tê dayîn hebûna wan bê astengkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-misre-ji-bo-parastina-destkeftiyen-xwe-tedikosin-44309

Çavkanî:JINHA



## Beyannameya Jinan hat eşkerekirin

Di Beyannameya Jinan a Rêveberiyên Herêmî ya Amedê ya DEM Partiyê de hat daxuyandin ku dê bajêr bi projeyên wekî bi kooperatîfên jina azad ber bi navendên jiyana azad ve bi rê ve bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/beyannameya-jinan-hat-eskerekirin-44319

Çavkanî:JINHA



## Li Yemenê ji ber krîza heyî her diçe jiyana jinan zehmet dibe

Li Yemenê ji ber pevçûnên ku didomin û bihayê her tiştî her dem zêde dibe mercên jiyanê zehmet dibin. Jinên li Taizê dijîn ji ber bihabûna jiyanê û tunebûna derfetên ketin pirsgirêkan dijîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-yemene-ji-ber-kriza-heyi-her-dice-jiyana-jinan-zehmet-dibe-44321

Çavkanî:JINHA



## Guherînên avhewayê li Tûnisê zêdetir bandorê li jinan dikin

Rawda Al-Qafraj, bal kişand ser guherîna avhewayê ya li Tûnisê, diyar kir ku ev yek zêdetir li ser jinan bandorên neyînî çêdike û got: “Ji ber germahiya zêde ya demsalan, çavkaniyên debarê yên jinan tune dibin.”

https://jinhaagency.com/ku/ekoloji/guherinen-avhewaye-li-tunise-zedetir-bandore-li-jinan-dikin-44323

Çavkanî:JINHA



# [Leyla Guven: Gelê Kurd tevî ewqas êş û eleman jî dibêje aştî](https://jinhaagency.com/ku/rojane/leyla-guven-gele-kurd-tevi-ewqas-es-u-eleman-ji-dibeje-asti-44330)

Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji "Konferansa Aştiyê" re nameyek şand û got: "Hêzên hegemon û emperyalîst naxwazin pirsgirêka Kurd çareser bibe û bi qasî ji destê wan tê faşîzmê bi pêş dixin."
https://jinhaagency.com/ku/rojane/leyla-guven-gele-kurd-tevi-ewqas-es-u-eleman-ji-dibeje-asti-44330
Çavkanî:JINHA



# [Ji berxwedêrên Mîgrosê Gulhan Albayrak hat qetilkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-berxwederen-migrose-gulhan-albayrak-hat-qetilkirin-44332)

Gulhan Albayrak a beşdarî Berxwedana depoya Mîgros a Şekerpinarê bû û yek ji pêşengên berxwedanê bû, ji aliyê kesekî navê wî nediyar ve bi çekê hat qetilkirin. DGD-SEN'ê got: "Soza me ji Gulhanê re ewe ku em ê hesabê wê bi jinan re bipirsin."
https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-berxwederen-migrose-gulhan-albayrak-hat-qetilkirin-44332
Çavkanî:JINHA



## Jinên Dêrsîmê şaredariyek çawa dixwazin?

DÊRSIM - Jinên Dêrsîmê diyar kirin ku qeyûmên hatine tayînkirin tu xizmet ji wan re nekirine û got ew dema nû de şaredariyeke ku wan guhdar dikin, nav gel de dixwazin.
https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/229579?page=2
Çavkanî:JINHA



## Jinên Îdirê: Bi kevçî didin û bi çoçikê ji me digirin

ÎDIR - Jinên kurd, azerî û tirk ên li Îdirê dijîn bal kişandin ser çaresernekirina pirsgirêkên bajêr ên wekî av, rê û binesaziyê û gotin: "Ligel wan pirsgirêkan qeyraneke aborî heye û nikarin debara xwe bikin. Sedema vê qeyranê Erdogan e. Bi kevçî didin û bi çoçikê ji me digirin."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/229583?page=2

Çavkanî:JINHA



## Serdanên ji bo pêşangeha bîranîna şehîdên Helebceyê didomin

Bi armanca bîranîna şehîdên kîmyabarana Helebce, RJAK'ê duh li navenda bajarê Kerkûkê pêşangeheke wêneyan vekir û tê payîn sê rojan bidome. Şandek ji beşa Peywendiyên Yekitiya Jinên Herêma Kurdistanê serdana pêşangehê kir.
https://rojnews.news/ku/?p=312341
Çavkanî:ROJNEWS



## 'Jinên Helebce bi kêrhatinên xwe derfetên kar avakirine'

Çalakvanên jin ên Helebce diyar kirin pêşketinên ku jinan bidestxistine bi hewldan û kêrhatinên wan bûye, bi taybetî jî afirandina derfetên kar de. Her wiha dan zanîn ji bo bidestxistina tevayî mafên jinan wê têkoşîna wan berdewam bike.

https://rojnews.news/ku/?p=311642

Çavkanî:ROJNEWS



# [Gultan Kişanak: Em ji bo serkeftina gelê xwe têdikoşin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/gultan-kisanak-em-ji-bo-serkeftina-gele-xwe-tedikosin-44360)

Namzeta hevşaredariyê ya DEM Partiyê ya Bajarê Mezin a Enqereyê Gultan Kişanak di Doza Kobanê de axivî û diyar kir ku armanca ew nîne ku bi kesekî bidin qezenckirin an jî windakirin û ev tişt anî ziman: "Em ji bo serkeftina gelê xwe têdikoşin."


https://jinhaagency.com/ku/rojane/gultan-kisanak-em-ji-bo-serkeftina-gele-xwe-tedikosin-44360

Çavkanî:JINHA



# Li Başûrê Kurdistanê pirsgirêka mûçeyê ya karkeran berdewam dike

Gulala Sadiq, diyar kir li Herêma Başurê Kurdistanê pirsgirêkên der barê mûçeyên memûr û karkeran hêj nehatiye çareserkirin û wiha got: "Hikûmeta Herêma Kurdistanê nizane wê mûçeya din kengî bê dayîn."
https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-basure-kurdistane-pirsgireka-muceye-ya-karkeran-berdewam-dike-44348
Çavkanî:JINHA



# [‘Ji bo aştiyê divê têkoşîna hevpar ya jinan were xurtkirin’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-astiye-dive-tekosina-hevpar-ya-jinan-were-xurtkirin-44347)

Seroka Navenda dîplomasî ya Navnetewî Karîma Ghanem diyarkir ku ji bo pêkanîna wekheviya zayendî û ji bo bi hêzkirina bejdariya aktîf ya jinan di pêvajoya aştiyê de divê têkoşîn were bilind kirin û giringiya têkoşîna hevpar a jinan bi bîr xist.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-astiye-dive-tekosina-hevpar-ya-jinan-were-xurtkirin-44347
Çavkanî:JINHA



# ['Divê ji bo jin û zarokên xwedî pêdiviyên taybet çareseriyên mayînde bên hilberandin’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ji-bo-jin-u-zaroken-xwedi-pediviyen-taybet-careseriyen-mayinde-ben-hilberandin-44345)

Şaden Moataz û Magda Soliman, diyar kirin divê li Misirê têkildarî pirsgirêkên jin û zarokên xwedî pêdiviyên taybet rû bi rû dimînin çareseriyên mayînde bên hilberadin û dest nîşan kirin divê têkildarî malbatên hewceyê agahiyê xebatek lezgîn bê kirin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ji-bo-jin-u-zaroken-xwedi-pediviyen-taybet-careseriyen-mayinde-ben-hilberandin-44345
Çavkanî:JINHA



# Jinên beşdarî Newroza Depê bûn: Divê em her dem li kêleka hev bin

Jinên ku beşdarî pîrozbahiya Newrozê ya li navçeya Depa Xarpetê starta wê hat dayîn bûn ev peyam dan: “He em hebin, wê agirê Newrozê were vêxistin. Divê her dem em li kêleka hev bin.”
https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-besdari-newroza-depe-bun-dive-em-her-dem-li-keleka-hev-bin-44343
Çavkanî:JINHA



# Tevgera jinan a kurd li Amedê hat nîqaşkirin

AMED - Navenda Bîrê bi sernavê “Duh û îroya tevgera jinên kurd û perspektîfên wê yên pêşerojê” panelek li dar xist.
https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/229824
Çavkanî:JINNEWS



## Jinên ku bi canê xwe, agirê Newrozê geş kirîn-I

Agirê Newrozê ku beriya hezaran salan li dijî zilma dehaqan hatî pêxistin, jinên berxwedêr bi agirê bedena xwe geştir û gurtirkirin. Bi gotina ‘Ez bûm Newroz, bûm Mazlûm’ bûn sembola serhildan û berxwedana li gelek deverên Kurdistanê û wateyek nû bi Newrozê dan qezençkirin.
https://rojnews.news/ku/?p=312276
Çavkanî:ROJNEWS




## ‘Li Tûnisê ji bo werzîşvanên jin piştgiriyek têrker nayê dayîn’

Seroka Yekitiya Jinên Tûnisê û Klûba Jîmnastîkê Malîka Benous diyar kir ku tevî serkeftinên di asta herêmî û navneteweyî de werzişvanên jin ên Tûnisî piştgiriyek nabînin.
https://jinhaagency.com/ku/werzis/li-tunise-ji-bo-werzisvanen-jin-pistgiriyek-terker-naye-dayin-44365
Çavkanî:JINHA



## ‘Em ê bi gel re texrîbatên ku qeyûman çêkirine çareser bikin’

Namzeda hevşeredariya Peyasa Amedê ya DEM Partiyê Bêrîvan Gulşen Sîncar diyar kir ku wê polîtîkaya li dijî çareserkirina texrîbatên ku qeyûman çêkirine, bi gel, sazî û bernameyan diyar bikin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/em-e-bi-gel-re-texribaten-ku-qeyuman-cekirine-careser-bikin-44366
Çavkanî:JINHA



## ‘Hêvîdar im ku roj were tu jin ji ber ku jin e rastî zextê neyê’

Jinên ku di metroya Tehran-Karajê de wek firoşkarên seyar dixebitin rastî tacîz, şer, dizî, ruşvet û gelek pirsgirêkên din tên û dibêjin, "Hêvîdar im ku roj were ku tu jin ji ber ku jin e, rastî zextê neyê.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hevidar-im-ku-roj-were-tu-jin-ji-ber-ku-jin-e-rasti-zexte-neye-44371

Çavkanî:JINHA



# ‘Dê dîwar werin hilweşandin’ di sîteya Weqfa Rosa Luxsembur de hat weşandin

Belgefîlma ‘Dê dîwar werin hilweşandin’ ku jiyana Fîgen yuksekdag, Aysel Tugluk, Gulten Kişanak û Sîbel Yigitalp vedibêje, di sîteya Weqfa Rosa Luxemburg de hat waşandin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/de-diwar-werin-hilwesandin-di-siteya-weqfa-roja-luxsembur-de-hat-wesandin-44373
Çavkanî:JINHA



# Jinên Suweydayê ji rojnamevanan xwestin dengê wan ragihînin

Jinên ku beşdarî çalakiyên protestoyî yên gel ku li Suweydayê bi mehan e berdewam dike bûne, bertek nîşanî ragihandina Sûriyeyê ya ku çalakiyê berovajî dike dan û bang li rojnamevanên bê alî kirin dengê wan ragihînin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-suweydaye-ji-rojnamevanan-xwestin-denge-wan-ragihinin-44375
Çavkanî:JINHA



## Şengal a me ye û em ê xwedî lê derkevin’

Hevşaredara bajarokê Siba Şêx Xidir Elmas Nayif bal kişand polîtîkayên şerê taybet yên tê xwestin vegera gel a Şengalê bê astengkirin û bi gotina “Şengal a me ye û emê xwedî lê derkevin” banga vegera ser axa xwe li Şengaliyan kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Sengal-a-me-ye-u-em-e-xwedi-le-derkevin-44384

Çavkanî:JINHA



## Însiyatîfa Têkoşîna Li Dijî Dagirkerî û Qirkirina Jinan piştgirî da pêngava TAJÊ

Însiyatîfa Têkoşîna li dijî Dagirkerî û Qirkirina Jinan a ji bo aştî û ewlehiyê ragihand ku beşdarî pêngava TAJÊ ya di 8’ê Adarê de ragihand û wê heta 3’yê Tebaxa 2024’an berdewam bike dibin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/Insiyatifa-tekosina-li-diji-dagirkeri-u-qirkirina-jinan-pistgiri-da-pengava-tajE-44386
Çavkanî:JINHA

## Rojnamegera jin a Lîbyayî bi karîkaturan pirsgirêkên civakî ronî dike

Karîkaturîst Fatima Al-Warfallî ya li Ajansa Nûçeyan a Lîbyayê dixebite, bi hunera xwe re pirsgirêkên civakî digre dest û amadekariya vekirina pêşangeha xwe dike.
https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/rojnamegera-jin-a-libyayi-bi-karikaturan-pirsgireken-civaki-roni-dike-44387
Çavkanî:JINHA




## Jinên Tûnisê bi bernameya radyoyê hişmendiyê ava dikin

Bernameya radyoyê ya bi navê 'Em Jin in' ku yekemîn bernameya femînîst a li Nabeula Tûnisê ye, ronahiyê dide ser pirsgirêkên jinan û di heman demê de tê armanckirin ku der barê jinan de hişmendiya civakî ava bike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunise-bi-bernameya-radyoye-hismendiye-ava-dikin-44388

Çavkanî:JINHA



## ‘Ragihandin bandorê li jin û ciwanan dike’

Mamosteya masterê ya beşa ragihandinê û pispora perwerdeya ragihandinê Şenge Dilêr diyar kir ku divê bi semîner û panelan jinên di karê ragihandinê dixebitin der barê rola xwe de bibin xwedî agahî û bi rola xwe rabin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/ragihandin-bandore-li-jin-u-ciwanan-dike-44390
Çavkanî:JINHA



## Hunermend Aynur Dogan: Keça Kurdan êdî emanetê we ye

Hunermend Aynur Dogan ji bo strana bi navê ‘Kaç Kurdan’ ku demekê dihat xwestin li studyo û ser dikê were gotin, diyar kir ku ji aliyê Şivan Perwer ve hatiye qedexekirin û got: “Keça Kurdan êdî emanetê we ye!”
https://jinhaagency.com/ku/rojane/hunermend-aynur-dogan-keca-kurdan-edi-emanete-we-ye-44392
Çavkanî:JINHA



## [Faten Atallah: Jinên Xezayê ji bo debara xwe bikin li çavkaniyan digerin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/faten-atallah-jinen-xezaye-ji-bo-debara-xwe-bikin-li-cavkaniyan-digerin-44403)

Li Xezaya ku bi mehan e bi êrişan re rûbirû ye; jin ji bo jiyanê, li rê û çavkaniyan digerin. Faten Atallah diyar dike ku ji bo xwe û bi hezaran jinan li riyên debarê digere û bang li civakên navneteweyî kir ku ji bo jinên Xezayê bikevin tevgerê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/faten-atallah-jinen-xezaye-ji-bo-debara-xwe-bikin-li-cavkaniyan-digerin-44403

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Êlihê: Gel û îradeya vî bajarî diyar e](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-Elihe-gel-u-iradeya-vi-bajari-diyar-e-44404)

Jinên beşdarî Newroza Êlihê ya bi coş bûn, bal kişandin ser şerê taybet û gotin: “Bila dijminê me vala vala bi hêvî nebin, Êlih ya me ye.” Jinan ev peyam dan: “Gel û îradeya vî bajarî diyar e.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-Elihe-gel-u-iradeya-vi-bajari-diyar-e-44404

Çavkanî:JINHA



# Nebûna avê li Yemenê bandorek nerênî li jiyana jinan dike

Jinên li çolwarên bajarê Taiz ya Yemen jiyan dikin, ji bo çend lître ava vexwarinê bi dest bixin, neçar dimînin bi kîlometreyan rê biçin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/nebuna-ave-li-yemene-bandorek-nereni-li-jiyana-jinan-dike-44407
Çavkanî:JINHA



# Jinên li qada Newroza Amedê: Niha dema azadiyê ye

Jinên ku li qada Newroza Amedê bûn, daxwaza azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kirin, bal kişandin ser yekitiya gelê Kurd û gotin ku dema azadî û aştiyê hatiye.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-li-qada-newroza-amede-niha-dema-azadiye-ye-44435
Çavkanî:JINHA




# Parlamentera Tûnisê: Divê em bibin dengê jinan li parlamentoyê

Wekîla Emel El-Medab diyar kir ku ew ê li dijî zîhniyeta serdest a ku jinan ji siyasetê dûr dixe ji bo jin di nava siyasetê de çalak bin dixebitin û got: “Îro 24 jinên çalak di meclisê de cih digrin. Girîng e ku em bibin dengê van jinan.”
https://jinhaagency.com/ku/siyaset/parlamentera-tunise-dive-em-bibin-denge-jinan-li-parlamentoye-44438
Çavkanî:JINHA



# Çîçek Kobanê û 3 girtiyên din hatin sirgûnkirin

Dozgîn Temo (Çîçek Kobanê) û 3 girtiyên din ku li Girtîgeha Hejmar 2 ya Rihayê dihatin ragirtin, bêyî daxwaza xwe hatin sirgûnkirin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/Cicek-kobane-u-3-girtiyen-din-hatin-sirgunkirin-44442
Çavkanî:JINHA



# Darizandina jinên ji ber çalakiyên 25’ê Mijdarê hatibûn binçavkirin dest pê kir

Doza ku der barê 17 jinên di 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna bi Şîdetê re hatibûn binçavkirin û di navbera wan de rojnameger Zeynep Durgut jî hebû hatibû vekirin, hat paşvexistin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/darizandina-jinen-ji-ber-calakiyen-25-e-mijdare-hatibun-bincavkirin-dest-pe-kir-44443

Çavkanî:JINHA



## Rêxistinên jinan tev li hemleya 'Li dijî qirkirina jinan bibe dengê parastinê' bûn

NAVENDA NÛÇEYAN - Tevger û rêxistinên jinan ên kantona Reqayê ragihand ku piştigiryê didin hemleya Tevgera Azadiya Jinên Êzidî ya bi dirÛşma ´Li dijî qirkirina jinan bibe dengê parastinê´.
https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/229645
Çavkanî:JINNEWS



## Jinên Efrînî:Rastiya dagirkeriya dewleta Tirk qetilkirin û îşkence ye

Jinên koçberên Efrînê ku li kantona Şehbayê dijîn, der barê bûyera qetilkirina Ehmed Xalid Memo de bertek nîşan dan û gotin ku li dijî bûyer û komkujiyên li Efrînê divê tu kes bêdeng nemîne û xwedî li zarokên Efrînê derkeve.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-efrini-rastiya-dagirkeriya-dewleta-tirk-qetilkirin-u-iskence-ye-44342
Çavkanî:JINHA



## [‘Li herêmên dagirkirî hebûn, nasname û siberoja jinan tune ye’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-heremen-dagirkiri-hebun-nasname-u-siberoja-jinan-tune-ye-44341)

Cîgira Encûmena Cîbicîkar a kantona Firatê Mizgîn Xelîl têkildarî salvegera dagirkirina Efrînê got: “Dewleta tirk giyan, raman, ruh û hebûna jinan dagir kiriye. Lewre li herêmên dagirkirî jin di xeteriyeke mezin de rû bi rûyê qirkirinê ne.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-heremen-dagirkiri-hebun-nasname-u-siberoja-jinan-tune-ye-44341

Çavkanî:JINHA



## [Li Idlibê nexweşiyê kronik zêde dibe gel nagihêje mafê tendirûstiyê](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-idlibe-nexwesiye-kronik-zede-dibe-gel-nagiheje-mafe-tendirustiye-44368)

Li Idlibê ji ber qirêjiya avê, bi taybet di jinan de ne aramî û sendroma rûviyan de zêdebûn tê dîtin. Ji ber kêmaniya xizmeta tendirûstiyê û aboriyê jin diyardikin ku nikarin tedawî bînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-idlibe-nexwesiye-kronik-zede-dibe-gel-nagiheje-mafe-tendirustiye-44368

Çavkanî:JINHA



# Jinên Kurd di xeta agir de agirê Newrozê vêxistin

Bi pêşengtiya jinên Kurd yên li xeta agir a bi êrişên dewleta Tirk re rû bi rû ye, agirê Newrozê hat vêxistin. Jinan gotin ku ew ê bi gurkirina agirê serkeftin û azadiyê misoger bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-kurd-di-xeta-agir-de-agire-newroze-vexistin-44389

Çavkanî:JINHA



# Zarokeke 15 salî di çemê Zirganê de xeniqî

Duh, zarokeke keç a 15 salî bi navê Nêrmîn Xelîl li gundê Eradê ê girêdayî navçeya Dirbêsiyê di çemê Zirganê de xeniqî.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zarokeke-15-sali-di-ceme-zirgane-de-xeniqi-44398

Çavkanî:JINHA



## Newroz vejîn û têkoşîna li dijî zilmê ye’

Hediya Mihemed a di teqîna Newroza 2015’an a li Hesekê zarokên wê jiyana xwe ji dest dan got: “Newroz ji bo me rojeke dîrokî ye rojeke nû ye. Dîroka vejîn û têkoşîna li dijî zilmê ye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/newroz-vejin-u-tekosina-li-diji-zilme-ye-44402

Çavkanî:JINHA



## Jinên Helebce bi destê xwe yên rengîn hunerê dixilûqînin

Dema mirov dikeve nava parqa ‘Şarê Yarî’ ya Helebce hejmarek kursiyên reng û reng bi nivîsên ku peyama hevsengî, aştî û bi hev re jiyan didin dibînin, ev parq weke pêşangehek ya wêneyan lê hatiye û bi destê jinan ev reng hatine xilûqandin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/jinen-helebce-bi-deste-xwe-yen-rengin-hunere-dixiluqinin-44405

Çavkanî:JINHA



## Li kampên Idlibê jinên ducanî nikarin xwe bigihînin xizmetên tenduristiyê

Jiyana jinên ducanî yên ku li kampên Idlibê yên bê îmkanên tenduristiyê dijîn di metirsiyê de ye. Jinekolog Sûzan El-Hecî diyar kir ku divê bi amadekirina klînîkên gerok û ambûlansan gihandina saziyên tenduristiyê di dema xwe de bê çalakkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-kampen-idlibe-jinen-ducani-nikarin-xwe-bigihinin-xizmeten-tenduristiye-44434

Çavkanî:JINHA



## Mijara hejmara 6’an a Kovara Afaq Almaraa berxwedana jinên Rojilata Navîn e

Gerînendeya giştî ya Kovara Afaq Almaraa Nergîs Îsmaîl ku li Bakur Rojhilatê Sûriyeyê bi Erebî weşanê dike, li ser hejmara 6’an a kovarê axivî û got ku di hejmara nû de li ser berxwedana jinên Bakur Rojhilatê Sûriyeyê û Rojhilata Navîn hatiye kirin.
https://jinhaagency.com/ku/rojane/mijara-hejmara-6-an-a-kovara-afaq-almaraa-berxwedana-jinen-rojilata-navin-e-44436
Çavkanî:JINHA



**Kongra Star**

**23-3-2024**